Mistefa Hicrî: “Muhendis Riza Xeyatî hertim arman-ca sereke ya pîlanên rejîmê bo”

•••» 3

Teymûr Mistefayî: “Xomênî bi hêzên xwe ragehand ku rehmê bi tu kesî nekin”

•••» 5

Mihemed Saih Qadirî : “Fed-eralîzm Çareseriya herî baş e bo parçenebûna Îranê”

•••» 6

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

AGIRÎ

Duheftînameyek Siayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (218) 21.11.2013 Buha (150) Tûmen

Deqa daxuyaniya PDKÎ derheq koça dawiyê ya Muhendis Riza Xeyatî R: 2

Hevpeyvîna bi pêşmergeyê kevnar ê PDKÎ, birêz Xale Mehmûd re R: 8

Cîhaneke hejiyê zarokan R: 9

Beşa duyemîn ji gotara li ser Simkoyê Şikak R: 10

Oxir be Muhendis



Termê Muhendis Riza Xeyatî di goristana şehîdan ya PDKÎ de bi axê hate sipartin.

Kurdistanmedia: Termê Muhendis Riza Xeyatî kadrê kevnar ê PDKÎ ku bi bûyera dilêş ya trombîlê koça dawiyê kir, li goristan şehîdan a PDKÎ de bi axa pîroz ya nîştiman hate sipartin.

Dom R: 2

Armanca Îran û Amerîkayê ji gotûbêjan

Sergotar

Şehab Xalidî

Amerîka bona dijayetîkirina digel pirsa destpêregihîştina Îranê bi çeka navikî berevajiyê Îsraîlê êrîşî ser binkeyên navikî ên Îranê bike ku renge di warê siyasî û aborî de, bi nirxeke giran li ser Amerîkayê tewaw be. Lewra dixwaze hem Ewropayiyan bike karteke zextê li ser Îranê û hem jî bixwe ji riya dîplomasiyê ve pêşiya Îraneke etomî bigre.

Lê ji aliyeke din ve hinek ji karnasên siyasî li ser vê baweriyê ne ku Amerîka dixwaze Îran li Kendawê de ew qas bihêz be ku welatên Erebî ên Kendawê neçar bin li hemberî Îraneke bihêz de hewara xwe bo Amerîkayê bibin, û her poanekê bidne Amerîkayê da ku wan bi tenê nehêle, û asayî ye jî ku Amerîka dikare bi başî bi karta Îranê di rastaya berjewendiyên xwe ên siyasî û aborî de bilîze.

Rejîma Îranê jî bêguman pirsa xwe ya navikî û baskirin ji mehandina oranyomê wekî hêla sor kiriye bihêztirîn karta di destê xwe de, ji aliyekê ve bo wergirtina poanan û ji aliyekî din ve bo bêdengkirina Rojavayiyan li hemberî binpêkirina mafê hevwelatiyên xwe.

Lê weha dixuye ku Rojavayî qet nikarin poaneke wusa bidne rejîma Îranê ku cihê bombeya etomî bo dirêjkirina temenê vê rejîmê bigre, lewra ew gotûbêj û nêzîkî taktîkî ne, ji ber ku tu niyetpakiyek di vê piroseyê de bi tayabetî ji aliyê rejîma Îranê ve nahê dîtin.

Herwusa astengiyên li ser riya van gotûbêjan wekî: Pirsa Sûriyê, nîgeraniya welatên wekî Erebistana Seûdî, Birîtanya û bi taybetî Îsraîlê ji proseya gotûbêjan, sitratejînebûna van gotûbêjan, û eva ku biryarderê dawiyê Xamineyî ye, zehmet e ku ew gotûbêj bigîjin encameke dilxwaz.

Lewra ew gotûbêj vê demê dikare bi dilê tewahiya xelkê Îranê be ku bikare dawiyê bi hemû cure ferq û cudahî û binpêkariyeke mafê neteweyên belengaz ên Îranê bîne.

Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya koça dawiyê ya Muhendis Riza Xeyatî ragehandinek bilav kir ku deqa wê bi vî awayî ye:

Hemwelatiyên birêz!

Civatên xebatkar ên xelkê Kurdistanê!

Kadr û pêşmerge û endam û alîgirên PDKÎ!

Bi xem û kesereke zaf ve em radigehînin ku mixabin demjimêr 7'ê êvariya roja Şemiyê 25.08.1392 (16.11.2013) hevalê tekoşer, xebatkarê mandînenas Muhendis Riza Xeyatî kadrê ji mêjîn ê PDKÎ di temenê 80 saliyê û di bûyera dilêş ya hatûçûnê de canê xwe ji dest da.

Jidestdana kesayetiyekî wek muhendis Riza Xeyatî xisareke pirr mezin e ji bo tevgera Kurd bi giştî û PDKÎ bi taybetî. Muhendis Riza Xeyatî ku xortekî Turk ê Azerî û kadrekî xwedî derbazbûyî yê PDKÎ bû, di sala 1312'an a Rojî li bajarê Xoy ya parêzgeha Urmiyê ji dayîk bû. Di sala 1332 (1953) piştî bidawîanîna qonaxa paş nawendî di arteşê de bi cih bû û piştî deh salan di sala 1963'an de bo Jandermiriyê hate veguhastin û di beşa bêsîm û dezgehên elektronîkî de şarezayiyeke baş bi dest xist.

Muhendis Riza Xeyatî di salên berî şoreşa gelên Îranê di bajarê Mehabadê de akincî bibû û bi reftara mirovdostane ya xwe cihê xwe di nav dilê xelkê vî Bajarî de vekir û ji nêzîk ve bi êş û azarên neteweya Kurd re nasyar bû. Bi serkevtina

şoreşa gelên Îranê û bê encambûna hewlên PDKÎ bo çareseriya pirsa Kurd li Îranê bi awayekî aştîxwazane, ku di encam de êrîş bo ser Kurdistanê û kuştina xortên Kurd li pey xwe re anî, Muhendis Riza Xeyatî hesta azadîxwazî û hevsoziya xwe di gel gelê Kurd û tevgera wê ya mafxwazane eşkere kir. Di demekê de ku ji bo xortên Kurd li Îranê de, tu riyek ji bo bergirî ji man û mafê wê nema, û tevgera Kurd berfirehtir bû û hewce bû ku helwesta hizbê, û nûçeyên çalakiyên têkoşerên Kurd bigîje xelkê Kurd û hevwelatiyan, bo vê meremê hewcehiya hebûna radyoyekê hest pê hate kirin. Eva Muhendis Riza Xeyatî bû ku zanist û şarezayiya xwe û heta beşek ji hewcehiyên radyoyê li ser daxwaza hizbê xiste xizmeta tevgera Kurd, û bajar û jiyana asayî bi cih hêla, û çiya û şoreş ji xwe re hilbijart, û bi avakirina radyoyê, dengê cesûrane Yê RDKÎ di 27'ê Cozerdana sala 1359 (1980) gehande guhê guhdarên xwe. Di wê demê de heya dema ku canê xwe ji dest da, radyo li himbêza xwe de pê gehand û bihêztir kir û hemû karên teknîkî ên vê radyoyê bi sedaqet û dilpakiyeke tewaw ve birêve bir.

Li jêr birûska bombe û bombaranê û di dema êrîşa hêzên rejîma Îranê bo ser radyoyê û neçar bûna bi veguhastina radyoyê ji vir bo ciheke din, û ji vî çiyayî bo çiyayeke din, eva hewl û tekoşîna Muhendis Riza Xeyatî bû ku rê neda ku dengê radyoyê bo bîstekê jî vemire. Her digel erkê giran yê pêregihîştina bi karê teknîkî yê radyoyê, bi sedan kadrî bo karê bêsîm û karkirina bi van dezgehan perwerde kir û bi dehan kadr jî wekî operator û beşa fenî pê gehandin.

Lewra di nav refên PDKÎ cihekî taybetî û hêja bi sedema wan zehmetên xwe ve hebû, û li cem şehîd Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û rêberên din ên hizbê û berpirsyarên radyoyê bi şêweyekî taybetî xweştevî bû,her wekî tevgera Kurd û PDKÎ, û RDKÎ jî bi vî qasî li cem Muhendis Riza Xeyatî xweştivî bûn.

Tekoşîna 33 salan ya Muhendis Riza Xeyatî di refa tekoşerên PDKÎ de wekî xortekî Turk ê Azerî mînakeke şaz ya hevxebatiya du neteweyên Kurd û Turk ên Azerî bû, û herwusa bi bîrhînerê hevxebatî û hevpeymaniya Komara Kurdistanê û hikûmeta Neteweyî ya Azerbaycanê bû. Muhendis Riza Xeyatî di heyamê 33 sal xizmet û xebata xwe di nava refên PDKÎ de, bi sedema emegdariya bi armancên PDKÎ û baweriya kûr bi

Dom R: 4

Doma R: 1

Li gorî rapora nûçegihaniya Kurdistanmedia, pêşnîveroya yekşemiyê 26'ê Xezelwera 1392, (16.11.2013) termê şehîd Muhendis Riza Xeyatî têkoşerê kevnar û naskirî û yek ji avakerên Radyoya Dengê Kurdistana Îranê (RDKÎ) bi beşdariya birêz Mesûd Tek sekreterê giştî yê PSK, û birêz Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ û endamên rêberî û kadr û pêşmergeyên PDKÎ di goristana şehîdan ya vê partiyê de bi axê hate sipartin.

Piştî veşartina termê vî şehîdî, di binkeya Deftera Siyasî de rê û resmeke sersaxiyê bo Muhendis Riza Xeyatî birêve çû û têde Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ derheq kesayetiya vî xebatkarî çend gotinek pêşkêş kirin. Mistefa Hicrî tevî îşarekirina bi xebata 33 salan ya navbirî got ku beşdariya hemwelatiyên Turk ên Azerî di xebata neteweyî ya Kurd û PDKÎ li dijî deshilata zal bi ser Îranê de nîşaneya hevxebatî û hevpêwendiya her du neteweyên Kurd û azerî ye û hijmareke zor ji birayên me yên Azerî, di gel têkoşerên Kurd, canê xwe gorî kirine ku Muhendis Riza Xeyatî yek ji wan mînakan e.

Hicrî herweha got ku Muhendis Riza Xeyatî di heyamê xebata xwe di nava refên PDKÎ bi dilsoziyeke zaf ve kar dikir û ew astengiyên ku ji aliyê Rejîma Komara Îslamiya Îranê ve jêre dihatne çêkirin, tu demekê ew di gel dudiliyê berbirû nedikirin, û heya dawiya jiyana xwe, wî xebata xwe domand. Piştre Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî yê PDKÎ ragehandina Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya koça dawiyê ya Muhendis Riza Xeyatî xwend û piştî wî jî, Îlham Çayçî bûka Muhendis Riza Xeyatî çend gotinek pêşkêş kirin û têde sipas û pêzanîn ji tev aliyan kir bona beşdarî di rêûresmê de .

Deqa axavtina birêz Mistefa Hicrî di rêûresma sersaxiya şehîd Muhendis Riza Xeyatî de

Amadebûyiyên rêzdar!
Xûşk û birayên rêzdar!
Birêz Mesûd Tek sekreterê giştî
yê PSK'ê!
û hemû hevalên rêzdar!

Bi xêr bên bo rê û resma rêztina ji yad û bîranîna heval û hevçeperê hêja Muhendis Riza Xeyatî. Me bi jidestdana kak Muhendis Riza Xeyatî, yek ji evçeperên xwe ên herî baş û yek ji kesayetiyên xebatkar ji dest da. Xûya ye ku em wekî şoreşvan û wekî hêzeke dijberê Komara Îslamiya Îranê ku di nava xebateke dijwar de bûn û niha jî di nav de ne, mirin ji bo me tewayan di pêxema bîr û baweriyên me de tiştekî çavnihêrkirî ye, û ne tişteke nû ye.

Muhendis Riza Xeyatî jî ne yekemîn şehîdê me ye, û ne jî yê dawiyê dibe. Heya ku ew riya berdewam be, heya ku zulm û zordarî hebe, em û nifşên piştî me jî wê dirêjiyê bidne xebatê, her wekî ku nivşên berî me jî ew şêweya xebatê domandin û gihandine me.

Tenê tiştek ku renge ji bo me cihê kul û kovanê be, ew e ku em di rewşeke weha de bi boneya vê zordarî û rewşa ewlehiyê ya herî tund ku di Komara Îslamiya Îranê de heye, em nikarin di rewşeke weha de nêzîkî hezkiriyên xwe bin ku eva hesretek e ku di dilê me têkoşeran de ye, û hem jî di nav dilê wan ezîzan de ye ku ji me dûr in, û li Îranê yan jî di welatên din de aware ne, û nikarin di demên dawiya jiyana xwe de, li dewra hevdu kom bibin.

Muhendis Riza Xeyatî temenê pirr ji şanazî yê xwe di PDKÎ de derbas kir, lewra mirina wî jî bo me wekî jidestdana hevalekî pirr nexweş e, lê em dikarin vê yekê tab bikin, em di PDKÎ de hîn bûn ku ji şehîdbûna kesayetiyên xwe dersê wergirin, ne eva ku em bêhêvî bin û kovandarbin. Ez dixwazim berî vê ku bas ji kesayetiya Muhendis Riza Xeyatî bikim, basekê li ser pirsa beşdariya Turkên Azerbaycanê bikim ku di xebata dûr û dirêj ya PDKÎ de beşdar bûn. Renge beşek ji we di temenê ciwaniyê de bin, yan beşek ji xelkê Kurdistanê gellek şarezayê vê meselê nebin, lê ez hez dikim ku vê yekê bêjim ku Muhendis Riza Xeyatî yekemîn Turkê Azerbaycanê nebû ku rêbaza PDKÎ ji xwe re hilbijart, jiber ku rizgariya neteweya xwe di çarçoveya diruşm û programên PDKÎ de didît. Me berê jî gellek ji hevwelatiyên wusa hebûne. Baş di bîra min de ye ku dema ez nûciwan bûm û digel Turkên Azerbaycanî em bi heve dijiyan, ji min re bas dikirin ku filan malbata Turk ya akinciyê bajarê min kesekî wan heye ku di nav PDKÎ de ye. Herwusa kesên wusa hebûn ku heya demên dawiya jiyana xwe wekî Muhendis Riza Xeyatî di nav PDKÎ de man û heya dawî nefesê bi rê û şopa PDKÎ emegdar man.

Eva hem şanaziyeke ku hem bo şoreşgerên xeyrî Kurd ji neteweya Turk, Belûç û Ereb digel PDKÎ di qonaxên cuda yên dîroka xebata PDKÎ de beşdar bûn û hem jî şanaziyeke bo PDKÎ ku bîr û bawer û bername û siyasetên wê, ne tenê kariye ku xebatkarên Kurd li dewra xwe kom bike, belkû bûye sîvanek, ku neteweyên din ên Îranê jî rizgariya xwe di vê çarçoveyê de dibînin. Me di nava refa kadr û pêşmergeyên xwe de gellek hemwelatiyên Turk ên Azerî hebûn, ku her di nav koma yên ku niha li vir rûniştine, gellek ji wan dizanin ku gellek Turkên Azerî hebûne ku di xebata li dijî Komara Îslamî ya Îranê, mil bi milê pêşmergeyên PDKÎ beşdar bûne û canê xwe jî gorî kirine, gellek hebûn ku kêm endam bûn û weke Kurdan ji welatê xwe aware bûn û neçar bûn ku hezkiriyên xwe û welatê xwe bi cih bihêlin. Lê ya ku Muhendis Riza Xeyatî ji yên din cuda dike, xebata navbirî ya di warê avakirina Radyoya Dengê Kurdistana Îranê (RDKÎ) di warê teknîkî de bû.

Di serdemekê de ku ne înternêt hebû, û ne jî TV bi vî rengî ku niha heye hebûn, û ne jî ragehandinên din hebûn, wê demê ku PDKÎ xebata bi xwîn li dijî Komara Îslamiya Îranê dest pê kiribû, û dengê wê nedigihîşte Îranê û bi tenê mabû, wê demê RDKÎ bi tenê çavkaniya nûçeyan ya dirust û cihê baweriyê bû, ew jî ne tenê bo xelkê Kurdistanê û azadîxwazên din ên Îranê, belkû heya bo beşek ji hêzên Komara Îslamiya Îranê ku her demekê bixwastiban ku nûçeyeke rast ji qada şer guhdarî bikin, guhê xwe didane RDKÎ. Radyoya Dengê Kurdistana Îranê bi sedema vê rola ku di xebata rizgarîxwazane ya neteweya me de hebû, bibû armanca Komara Îslamiya Îranê û hertim li jêr bombebaran û pîlanên curbicur ên Komara Îslamiya Îranê de bû.

Muhendis Riza Xeyatî jî hertim armanca sereke ya wan pîlanan bû. Lê serbarê tewahiya wan zext û metirsiyan, Muhendis Riza Xeyatî û komek ji pêşmergeyên PDKÎ ku Muhendis Riza Xeyatî ew perwerde kiribûn, tu carî bê hêvî nebûn, û netirsiyan û qet bo demjimêrekê jî ew radyo bi cih nehêlan. Di vî heyamî de ku Muhendis Riza Xeyatî berpirsayetiya vî karê giring girte stûyêxwe, û di destpêkê de bi kêmtirîn îmkanatan karî vê dezgeha ragehandinê bo PDKÎ bidest bixe, zêdetir ji deh carî ji vî çiyayî bo çiyayekî din, û ji vê kuneberê bo kunebereke din, û di nav berf û baran û sirr û germê de ew radyo vediguhastin, lê ew hinda ku di bîra min de be, kêm car hebû ku bileziya veguhastinê û danîna cardin ya radyoyê 24 demjimêr derbaz kiribin, di rastî de RDKÎ ku qerdarê zehmetên berî hemiyan Muhendis Riza Xeyatî bû, di wê demê de tenê dengê rastîn bû ku hawara belengaziya neteweya Kurd û xebatkarên azadîxwazên wê para Kurdistanê gehande guhê xelkê Îranê û beşek ji xelkê cîhanê.

Hezkirina RDKÎ gihîştibû astekê ku beşeke zaf ji hevalên me li dervayî welat û di Ewropayê de li baştirîn cureya radyoyê digeriyan bona vê ku dengê RDKÎ guhdarî bikin.

Di bîra me de ye dema ku li welatekî Ewropayî bi zehmeteke zaf ve wan dengê RDKÎ guhdarî dikir, ew yek weke mizgînî didane hevdu, û bi me radigehandin ku em jî li wir dengê RDKÎ guhdarî dikin. Em wan rojan û wan xizmetên mezin ji bîr nakin ku digel vê ku niha bi xweşî ve PDKÎ xwediyê hejmareke berçav ji pêşmergeyênşareza û pispor e di warê ragehandinê de, û xwediyê ragehandineke pêşkevtî ye, lê digel hemû vana jî cihê RDKÎ û

Dom R: 4

Doma R:3

her ku em bas ji RDKÎ dikin zehmetên Muhendis Riza Xeyatî pêkve girêdayî ne û ji bo me ji hevdu nahêne cudakirin. Ew xizmet û giringiya bû ku Muhendis Riza Xeyatî kiribû hezkiriyê hemû pêşmergeyên PDKÎ û hemû ew kesên ku Muhendis Riza Xeyatî nas dikirin, lewra her di destpêkê de sekreterên PDKÎ wekî şehîdan Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û endamên din ên rêberiyê hurmeteke taybetî ji bo Muhendis Riza Xeyatî hebûn, û hekî di bîra we de be, çend salan berî niha bi boneya salvegera avakirina RDKÎ bû ku li vir û her di vê holê de Muhendis Riza Xeyatî wekî şêvirmendê sekreterê PDKÎ bo karûbarên RDKÎ hate diyarîkirin. Ez xatircem im ku niha ew nûçeyanexweş ku di nav pêşmerge û alîgirên PDKÎ û li Kurdistanê, û li Ewropa û li her ciheke din ku bilav bûye, bi vê bûyerê kovandar in, û eva jî bixwe nîşaneya emegdariya PDKÎ ye bi hemû wan kesayetiyên ku di dirêjahiya dîroka bi xwîn ya PDKÎ de xizmeta vê partiyê kirine, û kevirek li ser dîwarê qahîm ê PDKÎ danîne.

Ji aliyeke din ve jî vedigere ser vê cangorîtî û zehmet û emegnasiya ku Muhendis Riza Xeyatî bo PDKÎ hebû. Di bîra min de ye dema ku em li çiya bûn, hevjîna wî hat û serdana wî kir, lê dema ku hevjîna wî vegeriya Îranê, rejîmê ew girt û digirtîgehê de ew xistne jêr îşkence û bêhurmetiyeke zaf, û Muhendis Riza Xeyatî li pêşberî du riyan de Danîn, ku yan dibe di gel hevjîna xwe bimîne û vegere Îranê, yan jî nikare bi hevjîna xwe re be. Lê Muhendis Riza Xeyatî riya duyemîn ji xwe re hilbijart, wate ji hevjîna xwe û zarokên xwe dûr ket û PDKÎ hilbijart. Wî wusa kir û heya demên dawiya jiyana xwe di nav PDKÎ xizmet kir û emegdariya xwe nîşan da, niha jî bi van xizmetên ku Muhendis Riza Xeyatî kirine, em dikarin bêjin ew bûye yek ji wan kesayetiyên PDKÎ, ku navê xwe di nava rûpelên dîroka pirr ji şanazî ya PDKÎ de nivîsand, û niha û di pêşerojê de jî, çi em yan jî nivşên din ku vê xebatê dê bidomînin, heya gihîştina bi armancên neteweya xwe, kesayetiya Muhendis Riza Xeyatî wekî kesayetiyên din ên siyasî wê her bilind bimîne.

Ez dixwazim di vir de qala tişteke din jî bikim, ku ew jî ew e ku bi sala ye ku kurê navbirî wate Emîr Xeyatî wekî pêşmergeyekî emegdar, û bûka wî ya ciwan ku wekî sekreterê giştî yê Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê bi sala ye ku bi bê çi çavnihêriyeke wusa, û bi ew qasî xwe bi kêm zanînê ve, kar û tekoşîna xwe didomînin.

Ez şarezayî jêhatîbûn û emegdariya wan ya kûr bi PDKÎ me. Min guman di vê de nine ku man û domandina karê wan beşek vedigere bo handana rehmetiyê bavê wan, wate ew di cihê hilbijartina riya çûna bo derveyî welat û jiyaneke rehet, niha bi me re ne, bona vê ku di di xebata li dijî vêzulma ku li xelkê me û li Turkên Azerbaycanê, û li Ereb û Belûçan tê kirin de, beşdar bin û ew jî wekî Muhendis Riza Xeyatî ew şanaziya bibe para wan ku di roja serkevtina xebatê de, wan jî para xwe têde hebe.

Tevî vê ku em di nav PDKÎ de tazîdariyê nakin, lê em li vir kom bûne da ku xema jidestdana hevrê Muhendis Riza Xeyatî bi ser hevdu de parve bikin, bona vê ku ev xema giran, bi tenê li ser milê kurê wî yê pêşmerge û bûka wî ya rûsor giraniyê neke, û her wusa hevderdiyê digel endamên malbata wî ya rêzdar bikin li her cihekî bin, bona vê ku em nîşan bidin ku ya ku di nav PDKÎ giring e, bîr û bawer û îman bi rizgariyê, û xebata ji bo neteweya me ye, di vê çarçoveyê de Turkên Azerbaycanê,û xwediyên ayîn û boçûnên cuda û neteweyên cuda di PDKÎ de her hemûyan heq û mafên wekî yek hene, û PDKÎ her di roja yekemîn de li ser vê bingeha ava bûye û ez hêvîdar im ku heya roja dawiyê, emê her ev dara bihêz bin ku bi van reh û rîşeyan ve dijîn, heya ku em digîjne kopka serkevtinê, û domandina xebatê, jiber ku xebat bo rizgariyê bê dawî ye. Lewra ez îznê ji tev aliyekê dixwazim ku sersaxiyê li hemûyan û bi taybetî li we ku ji nêzîk ve, we Muhendis Riza Xeyatî nas dikir û we jê hez dikir, û li wan hevalên ku li organa wî de kar dikirin û li endamên malbata wî ku niha li her ciheke Îranê yan her ciheke din bin, bi taybetî li her du hevalên hêja Emîr û îlhamê bikim, û bêjme wan ku em hemû kur û dersxwanê wan kesayetiyên mezin ên PDKÎ ne, û xatircem bin ku her wekî me bi jidestdana Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û berî wan jî Qazî Mihemed û bi dehan têkoşerên din xebata Kurd ne tenê li Kurdistana Îranê, belkû li tu beşeke din de nesekinî ye, û niha pêde jî nasekîne û dom heye.

Şadî û xweşiyên me yek in, û xem û nerehetiyên me yek in, û hemû xweşî û nexweşiyan em bi ser hevdu de parve dikin, lewra em vê şiyanê didn PDKÎ ku li hemberî meztirîn astengiyan de, baskên wê li jêr xem û kovanan de neçemin û serbilind û qahîm di qada berberekaniyê de xwe rabigire.

Cardin ez sersaxiyê dibêjme we û tewaya wan tekoşerên azadîxwaz ên Îranê bi hemû neteweyan ve, û sersaxiyê li hevalên hêja Emîr û Îlhamê dikim û sipas bo beşdariya we hemiyan jî, ku di vê bûyerê de we dilsozane wekî erkeke mirovî, hizbî û nîştimanî we beşdarî kiriye, û kadr û pêşmergên PDKÎ jî her ew çavnihêriya li wan tê kirin.

ww

Gellek sipasiya we dikim. Hêviya min saxî û silametî bo we hemiyan e, bi taybetî bo endamên malbata Muhendis Riza Xeyatî xweşteviyê me hemûyan. Sax û silamet bin û sipasiya we dikim

Ji aliyeke din ve jî vedigere ser vê cangorîtî û zehmet û emegnasiya ku Muhendis Riza Xeyatî bo PDKÎ hebû. Di bîra min de ye dema ku em li çiya bûn, hevjîna wî hat û serdana wî kir, lê dema ku hevjîna wî vegeriya Îranê, rejîmê ew girt û digirtîgehê de ew xistne jêr îşkence û bêhurmetiyeke zaf,

Doma Daxûyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ

demokrasî û bidestvehatina mafê neteweyên Îranê û ew dilsoziya ku ji taybetmendiyên vî xebatkarî bûn, çendîn carî ji aliyê rêberatiya PDKÎ ve, lewha pêzanînê pêşkêşî wî hate kirin û di van salên dawiyê de wekî şêvirmendê fenî yê sekreterê giştî yê PDKÎ hate diyarî kirin ku evne hemû wek sermayeya me'newî di jiyan û xebata xwe de, û li cihê jiyana xwe û di serê xwe de bi cih kiribûn.

Muhendis Riza Xeyatî her demekê ku bas ji hêvî û xweziyên xwe dikirin, digot ku yekemîn hêviya min ew e ku em bigîjin azadî û mafê neteweyî, û ya din ew e ku hekî ez negihîştme vê hêviya xwe û mirinê dem neda min, ez li ser

milê pêşmergeyên PDKÎ ber bi mala ebedî bême rêkirin û teslîmî xakê bême kirin.

Canjidestdana Muhendis Riza Xeyatî ji bo yek bi yek ji tekoşerên PDKÎ û bo tewahiya dilsozên tevgera Kurd û ew xortên ku wî perwerde kirin û pêgehandin, xemeke giran û xisareke mezin e, û bê guman yad û bîranînên vî têkoşerî bo heta heta di dilê xortên neteweya Kurd de, wê zindî bimîne.

Deftera Siyasî ya PDKÎ di heman demê de ku bixwe xemhilgir û kovandarê can jidestdana Muhendis Riza Xeyatî, û vî kadrê xwedî vec ê xwe ye, sersaxiyê li tewahiya xortên neteweya Kurd û Turkên Azerî û têhniyên demokrasî û bidestvehatina mafê neteweyî bi giştî, û malbata rêzdar Muhendis Riza Xeyatî bi taybetî dike, û hêviya vê yekê dixwaze ku jiyan û xebata vî têkoşerî bo xortên neteweyên Îranê mînak be û mînakên wusa zêde û zêdetir bin.

Bidestve bihên hêviyên Muhendis Riza Xeyatî

Pirr rêvîng be riya gihîştina bi azadî û demokrasiyê û mafê neteweyî

Riha wî şad û yad û bîra wî bi xêr be

PDKÎ

Deftera Siyasî

26.08.1392

17.11.2013

Nerîna Lîderan

Can Kêrî:

“Ez ne bawer im ku gotûbêjên navikî ên bi Îranê re derheq çeka navikî bigîjin encamê”.

Davûdoxlo:

“Min daxwaza lêborînê ji Şivan Perwer kir, derheq vê siyaseta şaş ku navbirî ji welat dûr xistibû”.

Devlet Bahçelî:

“Erdoxan û Barzanî dixwazin ku Kurdistana mezin ava bikin”.



Ehmedî Moqedem:

“Mortezewî pêdagirî dikir ku em girtiyan bişînne Kehrîzekê”.

33 salî berî niha di 26’ê Xezelwera 1358’an (1979) Xomeynî rêberê wê demê yê Îranê piştî sê mehan şerê malwêranker û dasepayî bi ser xelkê bê tawan û azadîxwaz ê kurdistasna Îranê de, biryra ragirtina şer da. Şerek ku di dîroka hevçerx ya xebata neteweyî ya Kurd de bi rêberiya PDKÎ bi şerê sê hevyî navê xwe derxist.

Bona vê armancê û nîqaşkirina li ser aliyên cur bi cur ên vê biryara Xomênî, me bi Birêz Teymûr Mistefayî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ re hevpeyvînek encam daye ku emê bala xwendevanên rojnameya Agirî bo vê hevpeyvînê rakêşin.

Pirs: Di destpêkê de kerema xwe bêjin ku çawa bû ew şer bi şerê sê heyvî hate naskirin?

Bersiv: Bi vê sedemê ve ku şerê Kurdistanê li roja 26 heya 28’ê Gelawêjê û fitwaya cîhada Xomênî li dijî gelê Kurd û berengariya hêza pêşmerge li hemberî êrîşên rejîmê, heya roja 26’ê Xezelwerê ku Xomênî peyama ragirtina şer bilav kir, sê heyvî dom kir, lewra bi şerê sê heyvî hate naskirin.

Pirsyar: Ev şer çawa dest pêkir, û destpêkerê vî şerî kî bû?

Bersiv: Rejîma Komara Îslamiya Îranê berî vî şerî jî çend şerên din wekî şerê Sine, Nexede û... hwe bi ser xelkê Kurdistanê de sepandibû, û geşkirina agirê van şeran, rê ji bo şerekî berfirehtir xweş kir ku di doma vê pîlanê de, di dema pevçûnan de li bajarê Pawe du kes bûne qurbanî, ku ew şer û pevçûn hêceteke zêdetir bû bona birêvebirina pîlanên xwe ku ew jî sertaserîkirina şer di Kurdistanê de bû.

Lewra di roja 26’ê Gelawêjê de şer di Pawe de dest pêkir û di roja 28’ê Gelawêjê Xomênî biryara cîhadê li dijî gelê Kurd derkir, û di vê biryara biyûm de bi hêzên xwe ragehand ku rehmê li tu kesî nekin, eva bû ku di heyameke kêm de, vî şerî seranserî Kurdistanê bi xwe girt, û diyar e ku rejîma Îranê şer dest pêkir.

Pirsyar: armanc ji pêkanîna vî şerî çi bû?

Bersiv: Armanc ji vî şerî pêşgirî ji tekoşîna PDKÎ bû, ku daxwaziyên vê partiyê wate demokrasî û mafê neteweyî li dijî bîr û baweriya paşvemayî û dijî geliyane ya Komara Îslamiya Îranê bû. Destpêkirina şer di Pawe de jî vedigere ser hilkevta sitratejî ya vê herêmê bi sedema bûna çend zaravayên cur bi cur û çend meseb û ayînên cuda.

Pirsyar: Çawa bû ku Xomênî piştî sê mehan biryara ragirtina şer da?

Bersiv: Têkşikana li pey hev ya hêzên rejîma Îranê li hemberî hêza pêşmerge de, û alozî û bê moraliya wan, sedema serekî ya vî şerî bû.

Pirsyar: Armanca Xomênî ji ragirtina vî şerî çi bû, gelo armanca wî çareseriya pirsa Kurd bû, ya armanceke din hebû?

Bersiv: Xomeynî piştî çend mehan niyeta xwe ji ragirtina şer bi eşkereyî bas kir û got ku armanc ji ragirtina şer ew bû ku “dijî şoreş” (hêza Pêşmerge) dorpêç bikin, û wan ji nav bibin, û herwusa armanceke din ya wan ew bû ku hêza têkşikayî û bê moral

birêz Teymûr Mistefayî Endamê Deftera siyasî ya PDKÎ

ya xwe serûber bike.

Pirsyara: Gelo ecama biryara ragirtina şer ji aliyê Xomêynî ve, çi bû?

Bersiv: Biryara ragirtina şer bû sedema pêkhatina du heyetan ku yek ji wan nûneratiya hikûmetê dikir û heyeta Kurdî jî, ji rêkxirawên wê demê ên beşdar di xebatê de pêk hatibû.
Ji ragirtina şer heya destpêkirina ducarî ya şer van du heyetan çend civîn bi hevre hebûn, ku tu encameke wê tunebû, û di vî heyamî de rejîm mijûlî xwe rêkxistinê bona cardin êrîşkirina li ser Kurdistanê bû, û hêzên Kurdistanî jî di vî heyamî de xwe ji berê zêdetir amade kirin û armancên xwe ji xelkê re şirove kirin.

Pirsyar: Di dawiyê de derheqî vê pirsê tiştekî taybetî heye ku we bas nekiribe?

Bersiv: Ji biryara cîhadê ve heya dawiya vî şerî, bi dehan gundên Kurdistanê ji aliyê hêzên rejîmê ve hatne kavilkirin, û Xelxalî bikujê navdar, deste deste xortên Kurdistanê di dadgehên ne dadperwerane û çend çirkeyî de bi îdamê mehkûm kirin, û rewşeke tirs û xofê di Kurdistanê de pêk anîn, û armanc ji cinayeteke wusa çavtirsandîkirina xelkê Kurdistanê bû.

Helbet xelkê Kurdistanê bi vê cinayetê û gellek cinayetên din, çavtirsiyayî nebûn û Kurdistan li jêr piyê kirêgirtiyên rejîmê de kirne polên agir, û nîşan dan ku bo gihîştina bi mafên rewa yê gelê xwe amadeyî her cure cangorîtiyekê ne, bê guman ew berberekaniya qehremanane di dîroka xebata rizgarîxwaziya neteweya me de bi xeta zêrên wê bê nivîsandin.

Birêz Mihemed Salih Qadirî Endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ

Roja 09.11.2013'an Konferansa "Kurd modêla aştî, demokrasî û çareseriyê gotûbêj dikin", ji aliyê Nawenda Lêkolîna Navdewletî bo Aştiyê li Rojhilata Navîn (IMPR) ve pêk hat. Giringiya vê konferansê di vê de bû, ku her wekî em dizanin ji dîroka pêkhatina dewleta Turkiyê heya çend salî berî niha ku Kurd dihatin înkarkirin, piştî vê ku pirsa diyaloga di navbera berpirsyarên Turkiyê û PKK hate ber bas, bo yekemîn car li ser asteke bilind û di Enqereya paytextê Turkiyê, konferanseke wusa ji aliyê rêkxirawa IMPR ve pêk hat. Rêpêdana karbidestên Tukiyê bo birêveçûna konferanseke bi vî awayî, vê yekê nîşan dide ku dewleta Turkiyê mijûlî pênasekirineke nû ye derheq pirsa Kurd, çi di navxwe ya Turkiyê û çi jî di nav welatên cîranê xwe de. Ew yek di demekê de ye ku heya çend salî berî niha jî Turkiye, Îran, Sûriye û Îraq li dijî Kurdan çend hevalbendiyek bi hevre hebûn. Di vêderheqê de me hevpeyvînek bi birêz Mihemedsalih Qadirî re pêk aniye ku emê bala we bo vê hevpeyvînê rakêşin.

Pirs: Gelo armanca rêkxirawa IMPR ji girtina konferanseke bi vî awayî çi bû?

Bersiv: Girtina konferanseke bi vî rengî vê yekê nîşan dide ku Turkiyeya caran ku bingehên hizrî yên Kemalîstî kiribûne qalibê sîstema hikûmeta xwe nemaye, û Turkiyeya niha di pêxema berjewendiyên xwe de naxwaze ku dirêjiyê bide siyasetên xwe ên berê derheq Kurd, û pirsa Kurdan piştguh ve bavêje.

Bo vê armancê pêkanîna vê konferasê û pêşwazîkirina Turkiyê ji serdana serokê Herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî û pêngavên wusa dikare alîkar be bo pêkanîna rewşa diyalog û ji hevdu halîbûn û helandina cemeda vê bê baweriyê ku di dirêjahiya dehan salî de di navbera Kurd û Turk de çê bûye.

Ew kar rê xweş dike bona bilezkirina piroseya aştiyê di Turkiyê û di herêma Rojhilata Navîn de.

Pirsyar: Gelo hemû aliyên siyasî ên çar beşên Kurdistanê di konferansê de beşdar bûn?

Bersiv: Beşdarbûyî pêk hatibûn ji: Aliyên siyasî ên her çar beşên Kurdistanê, akademîsyenan, çalakvanên mefê mirovan, nivîskar, nûnerên AKP, nûnerên çendîn balyozxane û medyayên biyanî û navxweyî ên Turkiyê.

Di vê konferansê de çendîn peyamên giring ji dîtingehên cuda ve bo çareseriya pirsa Kurd li Turkiyê hatin pêşkêşkirin û pêdagirî li ser bihêzkirina îradeyeke micid bo çareseriya pirsa Kurd û niyetpakî nîşandana van aliyan di vê derheqê de hate kirin.

Di vê beşê de hevalên AKP tevî pêdagiriya li ser vê ku ew paketa demokrasiya Erdoxan pêngavên destpêkî ne, û bê guman wê pêngavên din jî li pey xwe re bîne, hewla rakêşana beşdarbûyiyan bo nava vê piroseyê da.

Di navbera du rojan karê konferansê de, peyamên giring ji dîtingeha her yek ji pêşkêşkaran ve bona çawaniya çareseriya pirsa Kurd ketne ber basê.

Di her çar beşên Kurdistanê de tevî partiyên siyasî, kesên pispor, dîrokzan û mafperwer, akademî, rêkxirawên civaka medenî, rojnamevan, xwendekarên zanîngehê, siyasetvanê Turkiyê û Ereb axivîn.

Pirsyar: Tewerên sereke yên vê konferansê çi bûn?

Bersiv: Hewcehiya pêdaçûna bi ser tewahiya Yasaya Bingehîn ya Turkiyê û berhevdana wê digel rastiyên serdem ketne ber bas. Di beşeke din ya vê konferansê de pro. Ergîl Doxo jêve bû ku çar ji welatên herêma Rojholata Navîn (Îran, Turkiye, Sûriye û Îraq) avisê guherînkariyan in û wekî vê ku pêgiran bin, û em çavnihêr bin ku gelo piştî bidawîhatina qonaxa avisiyê, wê zarokên xwe himbêz bikin û digel xwe vê zarokên xwe jî bijînin, yan jî wê ji xwe cuda bikin? Armanca wê pirsa Kurd bû.

Serpêç Ataç çalakvanê mafê mirovan jî pêdagirî li ser vê yekê kir ku pirsa Kurd pirseke siyasî ye berî her tiştî, îca piştre pirseke kulturî û aborî ye.

Hekî van rastiyan qebûl nekin, wê demê Kurd neçar in ku riya cudabûnê bigirne pêş, û pêdagirî li ser vê yekê kir ku bila hemû aliyên siyasî ên Kurdistanê têkiliyên xwe bi hevre germ bikin û di warê rûhî de sînorên di navbera xwe de rakin.

Şemzîn Polat nivîskarê Kurd ê Turk ziman ku kesekî Zaza ye, qala van tirajidiyan kir ku di dirêjahiya dîrokê de hatiye serê Kurdan, û herwusa bas ji wan li-hevhatinên herêmî û navdewletî kir ku li dijî Kurdan hatine pêkanîn, û bas ji hewcehiya himbêzkirin û qebûlkirina hevdu li dijî înkarkirin û jinavbirinê kir û got ku Kurd li ser piyên xwe sekinî ye û li her demekê zêdetir pêdagiriyê li ser mafên xwe dike.

Piraniya beşdarên panelê pêdagirî li ser modêla Herêma Kurdistanê bo çareseriya pirsa Kurd di her yek ji welatan de kirin û sîstema federalî bi şêweya herî baş pênase kirin.

Pirsyar: Rola PDKÎ di vê konferansê de çi bû?

Bersiv: Rola PDKÎ gelelkî berçav bû, xwendina peyam û bilavkirina birûşora PDKÎ û gotara birêz Mistefa Hicrî bi zimanê Îngilîzî û program û peyrewa navxwe ya PDKÎ bi pîtên Latînî bala beşdaran bo aliyê xwe rakêşa û ew digel dîtingehên PDKÎ zêdetir nasyar kirin.

Di beşa pirsyaran de du pirs bi awayê jêr li nûnerê PDKÎ hatne kirin:
1-Bo çareseriya pirsa Kurd bi gştî û li Îranê bi taybetî we kîjan model û piroje pê baş e. Di bersivê de nûnerê PDKÎ got ku pirsa Kurd di naweroka xwe de pirseke siyasî ye û hewce ye ku di Yasaya Bingehîn ya her yek ji welatan de mafên wan ên neteweyî bihê qebûlkirin, û bi berçavgirtina taybetmendiyên her yek ji welatan û tevgera Kurd di van welatan de, bi hilbijartina riya diyalog û aştîxwazane pirsa Kurd çareser bikin.

Bo Îranê jî sîstemeke demokratîk û federalî siyaseta PDKÎ ye û baştirîn çareserî ye da ku rêgir be li pêşberî parçebûna Îranê û berjewendiya tev pêkhateyan biparêze. Mînaka Herêma Kurdistanê û Bexdayê yek ji wan çareseriyan e.

2-Çend sal in ku we xebata çekdarî ragirtiye, niha hûn çawan xebata xwe dimeşînin? Di bersivê de nûnerê PDKÎ got ku her di destpêkê de şêweya herî serekî ya xebata me, xebata diyalog û çareseriya siyasî û aştîxwazane bû, lê rejîma Îranê biryara cîhadê li dijî Kurd da, û şer bi ser Kurdistanê de sepand, lewra em neçar bûn ku çekê hilgirin û berevaniyê ji xwe bin.

Carek din di sala 1989'an de rejîma Îranê rêberê PDKÎ Dr. Qasimlo li ser maseya gotûbêj bo aştiyê teror kir, û piştre Dr. Şerefkendî di sala 1992'an de teror kir, û Dadgeha Mîkonosê selimand ku Îranê ew teror kiriye.

Niha jî şîpela îdaman dest pêkiriye, ku wusa bû dîtingeha Îranê bo Kurd xapandin û jinavbirin e, û dîtingeheke leşkerî û tepeserkarane ye, û bi vî halî jî em tevî xebata dîplomasî, ragehandin û rêkxistinî, em hêvîxwaz in ku derfeta çareseriya pirsa Kurdan di Îranê de, di gel deshilata nawendî ji riya siyasî ve hebe.

Ji bilî vê yekê, tevî netewe û azadîxwazên din ên Îranê emê hewla guherîna vê rejîmê bidin.

Amajekirina bi naweroka vê rejîmê û bê deshilatbûna Meclîsa Îranê û serkomar û di heman demê de hebûna deshilata reha û tewaw ya Weliyê Feqîh li ser bingeha yasayên esmanî, ne tenê her bo gelên Îranê belkû bo welatên herêm û cîhanê jî bûye metersiyeke mezin û bi piştgiriya ji rêkxirawên terorîstî ên Lubnan, Sûriye, Felestîn, Îraq û hewla dirustkirina çeka navikî, gefa li berjewendiya tev aliyekê dixo.

Her di vê başê de, pêşniyara me bo çalakvan û medyakarên bakûr eva bû ku hekî di warê mirovî û exlaqî de jî be, avrûyekê bidne bûyerên Kurdistana Îranê û hovîtiyên rejîma Komara Îslamiya Îranê.

Herwusa di bersiva berpirsekî PKK di konferansê de, ku wî PDKÎ bi vê tometbar kir ku di kempan de îzole bûne û tu çalakiya wan nemaye û dûr ketine ji felsefeya Qazîmihemed û amade nînin ku bi PJAK re têkiliyan danên, û tenê PJAK e ku di Kurdistana Rojhilat de xwediyê xebat û şehîd û girtiyên siyasî ye, û roleke berçav di rojeva îro de heye, û ên ku têne îdamkirin her hemû jî ser bi PJAK ne, bersiva nûnerê PDKÎ ew bû ku ew şanaziyê bi vê dikin ku Qazîmihemed avakerê PDKÎ bûye û bûye xwendegeha kurdayetiyê bo neteweya Kurd bi hemû pêkhateyên xwe ve.
Hekî pênasekirina îzolebûna me ew be ku em ji daxwazên xwe yên neteweyî paşve venagerin, yan eva ku piştgiriya aramiya Herêma Kurdistanê dikin, û di nav kom û komeleyên navdewletî de me zimanê xêrê bo pirsa Kurd di hemû beşan de heye, û destêwerdanê di nava karên wan de nakin, eva ne tenê her îzolebûn nine, belkû şanaziyeke mezin e, lewra jî tev hemû aliyan me têkiliyeke baş hene.

Lê çawa ye ku aliyê ku xwediyê tu sitratejiyeke zelal û eşkere nine bo pirsa Kurd, û ne têkiliyeke dostane bi tu alkiyeke Kurdistanî re hebe, û ne jî bawerî bi karkirina digel aliyên din hebe, lê di heman demê de, digel hemû welatên dagîrker pêwendiyeke baş hebe û tekrewî û dîktatorî şêweya xebat û reftara wan be, xwe nebîne, lê jêve be ku PDKÎ ku naçe jêr barê wan şêwe karan, partiyeke îzole ye.

Hêjayî basê ye ku nûnerên fermî bi navên PKK, PYD, PJAK bo konferansê nehatibûn bangkirin, lê xelkên ser bi wan ji BDP û ...hwd axavtinên wan dikirin.

Li ser yek beşa zêde ya hêz û aliyên naskirî ên Kurdistanê bo konferansê hatibûn gazîkirin, lê beşek ji wan bi sedema kêşeyên dukemênta seferê û rêpênedana hikûmeta Turkiyê nekarîbûn beşdar bin.

Digel vê yekê jî em dikarin bêjin ku peyama hemû aliyan bi awayekî di vê konferansê de deng veda. PDKÎ çend mehan berî birêveçûna vê konferansê aghehdarê vê konferansê bû.

Lewra bi hevahengiya digel rêkxirawa IMPR wekî yek ji beşdarên xwedî gotar bi awayekî fermî hate gazîkirin û di panêla piştînîvroya roja yekemîn de gotara xwe pêşkêşî amadebûyiyan kir û bala wan bo aliyê bîr û boçûnên PDKÎ derheq Rojhilata Navîn û modêla çareseriya Pirsa Kurd di her yek ji beşên Kurdistanê de, û herwusa esliyeta hovane û dijîgeliyane ya rejîma Komara Îslamî rakêşa.

Pirsyar: Sazdana konferanseke wusa heya çi radeyekê dikare li ser piroseya rewa ya Kurd di Rojhilata Navîn de bi bandor be?

Bersiv: Herwekî em dizanin, pirsa Kurd di Rojhilata Navîn de wekî karektereke xwedî nasnameya neteweyî - siyasî, aborî û ...hwd ye, û bi bê çareserkirina wê, Rojhilata Navîn nikare aramiyê bi xwe ve bibîne. Lewra girtina konferanseke wusa dikare alîkar be bona vê ku jîngeheke vekirî ya siyasî, li ser bingeha diyalogeke demokratîk bihê çêkirin ku bedela şer û înkara aliyan, bikarin ji hevdu halî bin û bi alîkariya hevdu kar bo çareseriya kêşeyan di pêşerojê de bikin.

Hevpeyvîn: Rehîm Gergulî

Mehmûd Nûrî

Mehmûd Nûrî naskirî bi Xale Mehmûd Kurê Ebdulla, sala 1314'an(1935) li gundê Qereqesab a ser bi bajarê Nexedê hatiy dinê.

Mehmûd Nûrî her di despêka zarokatiya xwe de weke zarokên din ên Kurdistanê bi sedema hejarî û nebûna îmkanatên xwendinê, ji çûyîna xwendingehê bêpar dibe. Lê bi dirêjahiya temenê pêşmergatiya xwe û di PDKÎ de dikare xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî hîn bibe. Xale Mehmûd di zarokatiya xwe de mijûlî karê Cotkariyê dibe û di temenê 18 saliyê de diçe xizmeta serbaziyê.

Xale Mahmûd derheq çavaniya nasîna PDKÎ dibêje: " Serdemê Komara Kurdistanê bi başî tê bîra min. Wî çaxî desteyek ji pêşmergên Komarê li gundê me de xelk bona pêşmergatiyê perwerde dikirin, bo yekem car li wir min pêşmerge dîtin.

Wî çaxî temenê min 10 salî bû û hêviya min ev bû ku ez bilez mezin bim û bikarim bibim pêşmerge û çeka PDKÎ bikme milê xwe de". Mehmûd Nûrî derheq tevlîbûna xwe bi PDK Îranê û refên pêşmergan re weha dibêje: " Demsala zivistana sala 1357'an (1978) min tevî 30 kesên din, li komîte şaristana Şinoyê û li bal Mirad û Nebî Qadirî ku wî çaxî berpirsên komîte şaristana Şinoyê bûn navêxwe bona pêşmergatiyê nivîsand û bi awayekî fermî ji wê rojê ve ez bûme pêşmerge û di xizmeta PDK Îranê de me".

Xale Mehmûd roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Roja Ku ez bûm pêşmergê PDK Îranê û min çeka şerefê kire milê xwe de, heya roja şehîdketina Dr. Qasimlo, rojên herî xweş ên jiyana min bûn, ew roj bi qasekê xweş bûnku tu caran min hest bi vê yekê nedikir ku min jin û zarokên xwe bi cih hêlane û haydarî jiyan û qedera wan ninim".

Di hember de Xale Mahmûd roja herî nexweş a jiyana xwe weha tîne ziman: " Roja herî nexweş a jiyana min roja şehîdketina Dr. Qasimlo bû. Baregehên me li Mame Xetîb bûn ku xebera şehîd ketina şehîd Qasimlo dane me, birastî ez pirr nerihet bûm, jiber ku şehîdkirina wî derbeke mezin bû ku li PDKÎ û bi giştî tevgera rizgarîxwazî ya gelê Kurd di Kurdistana Rojhilat de dike.

Eva roja herî nexweş a jiyana min bû û heya roja ku dimirim jî, ez nikarim ji bîr bikim. Hewceyî basê ye ku şehîdketina Dr. Şerefkendî jî birînek bi êş û jan bû".

Mehmûd Nûrî derheq jiyana xwe ya hevpar dibêje: "Sala 1355'an(1976) min tevî Zilêxa Heyderî xelkê bajarê Nexedê jiyana hevpar pêk anî û berhema jiyana me jî du Kur û keçek in. Lê mixabin salek berî niha Zilêxa ya hevjîna min bi sedema nesaxiyê canê xwe ji dest da, û xatirê xwe ji min û zarokên xwe xwest".

Mehmûd Nûrî dibêje: "Hêviya min ev e ku PDK Îranê tevî Taqima ku ji partiyê veqetiyane cardin hevdu bigirin û herweha hêviyek din jî min heye, ew jî ev e ku rejîma Komara Îslamî biherife û cardin em vegerin kurdistanê".

Xale Mehmûd rû li xelkê Kurdistanê dike û bi vê peyamê dawiyê bi hevpeyvîna xwe tîne: "Xelkê Kurdistanê! daxwaza min ji we ev e ku yekgirtî bin û zarokên xwe danêne ber xwendinê, da ku dîroka gelê xwe nas bikin û herweha daxwazê ji wan kesan jî dikim ku têkiliyên wan tevî Komara Îslamî hene û piştî nîştimanû neteweya xwe kirine ku vegerin ser rêya rast, niha jî ne direng e".

" Roja Ku ez bûm pêşmergê PDK Îranê û min çeka şerefê kire milê xwe de, heya roja şehîd ketina Dr. Qasimlo, rojên herî xweş ên jiyana min bûn, ew roj bi qasekê xweş bûn ku tu caran min hest bi vê yekê nedikir ku min jin û zarokên xwe bi cih hêlane û haydarî jiyan û qedera wan ninim".

Cîhaneke hejiyê zarokan

Fatih Salihî

Roja 20’ê November a her salekê hevdem e digel roja cîhanî ya pejirandina biryarnameya cîhanî a mafên zarokan û bi vî awayî, di piraniya welatên cîhanê de ew roj weke roja cîhanî a zarokan bi fermî hatiye naskirin.

Eva ku di vir de cihê basê ye hokarên navdêrkirina weha rojekê ne, ev jî vedigere bo vê ku bi sedema xisarên zaf ên mirovî di şerê yekem û duyemîn ê cîhanî ku di şerî yekemîn de pitir ji 10 milyon kesî, û di şerê duyemîn de pitir ji 70 milyon kesî canê xwe jidest dan, ku beşek zaf ji wan zarok bûn.

Lewra piştî bidawîhatina şerê duyemîn ê cîhanî û di encama hewlên zaf ên rêkxiraw û kesatiyên curbicur ên mirovdost, di 20’ê November a sala 1959’an de, biryarnameya cîhanî a mafê zarokan di rêkxirawa NY de hat pejirandin û piştî derbazbûna 30 salan, di 20’ê November a sala 1989’an de li Kora Giştî a NY de, ji aliyê welatên endam ve hat wajû kirin û bona piştevanî ji mafên zarokan û nehêlana êş û elemên ser wan, biryarname weke yasayek navnetewî ji hemû cîhanê re hat ragehandin.

Heya niha bi giştî ji 193 welatên endam di rêkxirawa NY de, 183 welatan bi awayekî fermî biryarnameya parastina mafên zarokan pejirandine û di perlemêta welatê xwe de jî deng jêre wergirtine. Îran jî yek ji wan welatan e ku di sala 1373’an (1994) de bi merc biryarnameya navbirî pejirandiye.

Lê eva di pejirandina mercdar a Komara Îslamî de bala mirov dikişîne aliyê xwe ev e ku, pejirandina biryarnameya han bûye sedema vê yekê ku bi awayek sîstimatîk Komara Îslamî mafên zarokan binpê bike, jiber ku di yasaya bingehîn a Komara Îslamî de ku li gorî mezheba Şî’e ya 12 îmamî ve hatiye darêtin hatiye ku, keç di temenê 9 saliyê de û kur jî di temenê 15 saliyê de qonaxa zarokatiyê derbaz dikin û dikarin herin nava pirosesa zewacê de, eva jî beravajî yasa û biryarnameyên cîhanî derheq parastina mafên zarokan e, çûnkî di bûryarnameya navbirî de hatiye ku mirov heya temenê 18 saliyê bi zarok tê hsibandin.

Di nav vê binpêkirina mafê zarokan di Îranê de jî, çend cur pêşêlkariyên din xuya dikin ku hewceyî basê ne, bo mîna ferq û cudahiya di navbera regezan de, jiber ku li gorî konwansyonên mafên zarokan nabe tu ferq û cudahiyek di navbera zarokan de hebe, lê ji her kesî re eşkere ye ku dî Îranê de ferq û cudahiyek zaf di navbera keç û kuran de heye û çavkaniya vê yekê jî zagona bingehîn a Îranê ye.

Yek din ji mafên sereke ên zarokan ku di piraniya welatên cîhanê de heta di welatên weke Îraq û Efxanistanê de jî, bê ferq û cudahî tê parastin û cîbicîkirin, mafê perwerdehî li gorî çanda netewî û zimanê daykî ye, lê mixabindi Îranê de ev maf bi tewahî tê binpêkirin û Komara Îslamê rê nade ku zarokên Îranê ku ji 6 netewe û ziman û kultorên cuda pêk tên, mifahê ji vê mafê wergire.

Eva jî vê yekê digehîne ku deshilatdarên Komara Îslamî bi awayekî armancdar dest avêtin asimîlekirina zarokên Kurd û netewên din ên Îranê da ku bikaribin bi vî awayî kesatiya wan jinav bibin û mêjiyê wan ji dîrok û şonas netewî ya xwe betal bikin.

Eva tenê çend mînak ji pêşêlkariyê Komara îslamî derheq mafên zarokan in, jiber ku hekî em berhevdanekê di navbera wan 54 madeyên ku weke mafên sereke di biryarnameya cîhanî ya mafên zarokan de hatiye digel siyasetên ku ji aliyê Komara Îslamî ve têne peyrewkirin, bi zelalî derdikeve ku tu mafeke zarokan di Îranê de nahên parastin û kesatiya zarokan di yasayên wî welatî de nahên berçavgirtin.

Daxwaz bo guherîna navê şeqama Simkoyê Şikak, yan derswergirtin ji rastiyên dîrokê?!

N: Mihemed Salih Qadirî

Bo arxayîn bûn ji merema siyasî ya Asoriyan ji vê kiryarê mêze bike meramnameya "Komîteya Azadiya Asoriyan" ku di sala 1917'an de û ji dema pêkanîna çekdarên Asoriyan li Urmiyê hatiye bilavkirin û di benda yekem de hatiye, ku armancên destpêkî yên vê komîteyê damezrandina dewleteke serbixwe bo Asoriyan li herêmên Urmiyê, Hekarî, Mûsil, Cizîr ...hwd ye û bo gihîştin bi vê armancê hemû şiyanên xwe bo zêdekirina kîne û kuştinê, li dijî xelkê wan deveran bikar aniye.

Piştî bilavkirina vê meramnameyê îdî Marşîmon bi eşkere Asorî han dane bo çek hilgirtin û jinavbirina Kurdan û Azeriyan li ser axa bav û kalên wan, û rêxweşkirin bo bidestveanîna xewnên xwe.

Fermandeyê serbazên Asoriyan jî ku navê wî axa Pêtros bûye, di sala 1918'an de berî kuştina Marşîmon hewla handana Asoriyên çekdar daye ku bi tu awayî rehmê bi Kurdan nekin û derban lê bidin. Piştî vê biryarê em dibînin ku bi hezaran çekdarên Asorî ku ji aliyê Rosiyan ve hatibûn çekdarkirin, di bereya wan de li dijî kurdan dikevne şer, û îdî her du alî yanî kurd û Asorî eva ku ji dest wan hatiye bo qirkirin û komkujiya hevdu kirine.

Helbet şerê Kurd û Asoriyan şerekî olî nebûye ku weke zaf aliyên nateba aliyên olî hebe, belkî şerek bûye ku aliyê siyasî û netewî hebûye. Her wek em dizanin Kurdan di dirêjahiya dîrokê de ne êrîşber û ne jî dagîrker bo ser xelk û axa tu kesî nebûye, belkî tenê û tenê bergirî ji ax û kerameta xwe kiriye. Eva jî mafek rewa û mafekî parastî bo hemû aliyekê ye ku bikeve ber êrîş û dagîrkirina aliyên dagîrkariya êrişber.
Piştî serketina şoreşa Oktobera 1917'an ku Linîn li hember berjewendiyên sitratejî yên Soviyetê bo parastina piştêna ewlehiya herêma li bin desthelata xwe, peyam bo Îran û Turkiyê şand ku ew wê axa wan çol bikin û yekîniya çekdarên Asoriyan hilveşînin, û dirêjî bi siyaseta Rosiya Tezarî li dijî wan welatan nadin. Îdî koşka hêviyên Asoriyan diherife û bi vî halî jî em dibînin Asorî bi bê ber-

Beşa 2 û dawî

hevdana rewşa piştî şoreşa Oktobrê tevî vê ku guherînên bingehîn bi ser siyaseta deverê de hatibûn, dîsan jî dirêjiyê didne dijayetîkirin bi xelkê deverê re.

Di vê serdemê de Simkoyê Şikak ku mîratgerê çend pişt li xebata neteweya kurd bo rizgarkirin û avakirina dewleteke serbixwe bû, tevî vê ku di nava bahozeke pîlan û encamên şerê yekem yê cîhanî û zextên Rosiyan û Osmaniya ji aliyekê, û dujmindarî û êrîşên desthelatdarên Îraniyan bo ser hêzên wan ji aliyek din ve mabû, lê hewla xwederbazkirin ji vê kirîzê û parastina serweriya kurd li ser axa kurdistanê dida, bi vî halî jî, li dervayî hezkirina xwe, dikeve nava bazineya pîlanên Rûs û Birîtaniyayê ku ji aliyê Asoriyan ve hatibû darêtin, ev pîlana zenga metirsiyeke mezin û micid bû bo têkçûna hemû xewn û pîlanên Simkoyê Şikak bo azadkirina axa Kurdistanê û avakirina dewleteke netewî ya kurd. Lewra Simkoyê Şikak razî nebûye ku bi her bûhayekê be rê bide heya ku pîlanên Rosiyan û Asoriyan ku avakirina dewleta Asorî li ser axa Kurdistanê bû, ser bigire.

Di sala 1918'an di rewşeke weha de bûye ku Marşîmon û Simkoyê Şikak di kevnebajarê Selmasê hevdu dibînin û Marşîmon hewla jirêderxistina Simko daye û qewlê hevxebatiyekê li dijî Îranê û avakirina desthilatek hevbeş dide. Ji aliyekî din Simko jî perîşe ye bo jidestdana axa Kurdistanê û avakirina dewleteke Asoriyan di devera bin desthilata xwe de, ku niha jî bo kurd wekî Kerkûka duyem a Kurdistanê ye. lewra Marşîmon di pêvajoya vê hevdîtinê de tê kuştin û heya niha çavaniya kuştina wê nehatiye eşkerekirin ka gelo çi di vê hevdîtinê de qewimiy ye.

Mixabin ev bûyera bû sedema şer û xwînrêjiyeke zor, û karesateke mirovî ji aliyê Asoriyan ve bi ser kurdan de hat, û bi vê sedemê xûşka Marşîmon bi navê Sirmê Xanimê bi hezaran çekdarên Asoriyan bo tolhildana kuştina Marşîmon şandne ser bingehên Simko li kelha Çehrîqê, û deverên derdora Selmas û Urmiyê, û di heyama çend rojan de bi hezaran jin û zarok û pîr û ciwanên bê guneh ên kurd bi awayekî hovane ji nav birin û yek ji wan kuştiyan dayîka Simko bûye. Niha piştî sed sal derbaz bûna bi ser vê bûyerê hêstik û pirça goriyên bûyerê di qada vê demê ya şer de şahidiyê bo rastiyên cînayeta han didin.

Ji aliyek din ve, vê bûyerê dijayetiya hevpêymanan li dij bizava kurd di wê serdema hestiyar de zêdetir kir û derfeteke mezin û dîrokî bo avakirina dewletek kurdî ji destê kurdan de derxist.

Asorî niha jî wusa difikirin ku eva Simkoyê Şikak bûye ku bi kuştina Marşîmon, xewnên wan bo çêkirina dewletek Asorî têk biriye, lê her çend rola Marşîmon bo vê meremê bandor jî hebûye, lê rastiya meselê eva nine û nabe ev bûyere berçavên wan bigirin heya ku rastiya arîşeyê di vê de nebînin ku çawa çarenivîsa xwe dan destê Rosiyan û Rosiyan jî piştî tewawbûna karê xwe, îdî pişta Asoriyan berdan û ev car bi sedema êrîşên Turkan ve Asorî tûşî wan biserhatiyên tirajidî bûn ku nediba bi serê wan hatiba.

Piştî derbazbûna 95 salî bi ser vê bûyerê, çi kurd yan jî Asorî di cihê handan û birîndarkirina hestên hevdu û dijayetîkirina tevî hêmayên netewî ên hevdu, ku ne dikare dermanê vê êş û azara tal be ku di derbazbûyî de hatiye serê wan, belkû xirabtir jî dike,

Dom :R 11

Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî

Bike kala bixwe mala:

Wekî ku, divê xort bi kalan re bizewicin. Lewre kal malê wan heye. Ne hewce ye ku ji nû de malê çê bikin. Lê bi xortan ra bizewice divê malê ji nûv de çêbike.
Ev gotin bi awayekî din jî tê gotin. "biki kala bixwî mala tê çi bikî ji xortê kum vala an tûrik vala".

Bi mezina bike cejnek , berî te xwariye:

Ezmûn pir giring e. Mirovên bi temenê xwe mezin xwedî ezmûnin jî,Heke mirov tim bi mezinê xwe bişêwire û bi wan re kar bike sûda wê yekê heye.

Bi peyvê paxir nabe zêr:

Ev gotın jî tê wateya ku kirin ji peyvê çêtir e. Tişt bi peyvê tenê nayê holê. Dema mirov kar neke tu tiştek çênabe.
Mirov çiqasî bi ser paxir de jî bipeyive dîsa nabe zêr. Lê mirov hewl bide û xebatê bike guherîn di her tiştî de çê dibe.

Bi peyvekê mirov dihere cinetê,bi yekê mirov dihere cehnemê:

Ku gotinên mirov ji bo xêrê be û başiya mirovan tê de be mirov dê here cinetê lê ne ji xêrê re be miro dê nebaşiyê jê bibîne û mirovê berdêla wê bide.
Divê mirov li peyvên xwe miqatebe,bi peyvekê jî gelek tişt têne guhertin.Gotinek dibe sedema qetla gelek mirovan an dibe sedema aştiyê û xweşiyê.Bi gotinekê serê mirov dikeve belayan.

Şaristana Sîrwan

A: îdrîs Sitwet



Şaristana Sîrwan yek ji şaristanên parêzgeha Îlamê ye û nawenda wê şaristanê jî bajarê Lomar e û ev şaristane li sala 1391'an (2012)ji şaristana Şîrwan Çrdawil cuda bû, ev şaristane ji bakur tevî şaristana Serabilê, ji başûr tevî şaristana Derêşehr, ji rojhelat tevî parêzgeha Loristan û ji rojava tevî şaristana Îlamê hevsînor e. Akinciyên vê şaristanê kurd in û bi kurdî û bi devoka Kelhorî dipeyvin û li hin deveran jî wek deverên Hîlan jî bi devoka Lekî dipeyvin.

Şaristana han 1100 Kîlometra çargûşe ye û ji sê bexş, û çar dêhistanan pêk tê.

Ev şaristane, şaristanek pir xweş û av û hewayek pir xweş û zêde av jî heye û weke yek ji xweştirîn şaristana parêzgeha Îlamê tê hesibandin û zêde av jî heye.

Em dizanin ku yek ji sedemên bingehîn ên peydabûna û şaristaniyetan, hebûna avê bûye ku di vê deverê de bi sedema rewşa coxrafiyayî û bitaybetî ava zêde, di dirêjahiya dîrokê de cih û warek baş bûye bo jiyana civakiya xelkê û niha jî şûnwarên kevnare vê deverê vê rastiyê diselimînin.

Piraniya akinciyên vê deverê mijûlî terşdarî (heywandarî) û cotkariyê ne û hinarên vê deverê binavûdeng in û her sal berhemên hinarên vê deverê dişînin bo şaristanên din, yan jî parêzgehên din.

Şûnwarên kevnar ên şaristana Sîrwan:

Yek ji girîngtirîn şûnwarên dîrokî di vê deverê de, bajarê kevnare Sîrwan e ku li gundekî bi navê Serab Kelan hilketiye. Ev bajare nawenda Îyaleta Masbezan bûye ku heya sedsala 4'ê jî rewşa siyasî, civakî û bajariyê parastiye û yek ji bajarên seyrangeha Şahên Sasanî û bixasmanî Enûşîrwan bûye.

Li gor vekolînên şûnwarnasan, ev bajare bi sedema Erdhejîn ku di sedsala 4'ê de pêkhatiye, herifiye û niha jî hin ji wê şûnwarê maye lê ber bi jinavçûnê diçe.

Herçend ku di Îlamê de tenê ev şûnware nine ku ber bi jinavçûnê diçe belkî şûnwarên zaf di kurdistanê de hene ku heya navê wan jî nahê bikarnîn û zêde jî jinav çûne bitaybet li parêzgeha Îlamê de.

Şûnwarên kevn ên wê şaristanê em dikarin îşare bi tepika kevn a gundê Çigînî, Kelha Sîrwan, Kelha Hîzder, Şikewta Berêzerd yan Kinatarîke, Şikewta Çilsitûn bikin.

Doma :R 10

baştir eva ye ku vegerne bo mentiqa lêborînê û hevdu qebûl bikin, û bi hevre jiyaneke aştiyane di cihê vê bedbextiyê de hilbijêrin, ku bi pîlana bîhaniyan, û bi destê xwe me tûşî xwe kiriye. Her ji ber vê yekê me pêdivî bi çêkirina rewşeke birayane tevî hevdu heye heya ku bi ders wergirtina ji derbazbûyî em wan bedbextiyan ji dîrokê re bi cih bihêlin, û em rê nedin ku ev bedbextî bo nifşa niha û pêşerojê bimînin.

Hekî çi daxwaza Asoriyan bo guherîna navê şeqama Simkoyê Şikak li bajarê Hewlêrê bi berçav nîşana kerb û nerazîbûna wan ji bûyera kuştina Marşîmon ji aliyê Simkoyê Şikak ve ye, lê ev bîrkirin hem dûr e ji mentiqa serdemiyane û hem jî narewa ye ku kêmîneyekî olî li herêma kurdistanê tevî danîna navê Marşîmon û dehan navdarên xwe li ser şeqam û cihên giştî ên Enkaweya Hewlêr, lê daxwazek bi vî awayî hebe ku nabe navê serkirdeyekî kurd li ser şeqameke paytextê kurdistanê bê danîn!!! Şik di vê de nine ku karê han tirsê dixîne ser jiyana kurdan û Asorî jî arîşên derbazbûyî bo pêşerojê vediguhêzin.

Em ji vê arxayîn in ku çi bi helwestên weha ji aliyê birayên Asorî ve û çi bi cîbicîkirina daxwazên wan, em nikarin qerebûya wan bûyeran bikin ku di derbazbûyî de rû dane. Ji aliyek din ve pêdivî ye ku birayên Asorî vê rastiyê bizanin ku her çi qas kesayetiya Marşîmon bal wan cihê hurmeta û xweştevî be, ev qas jî kesayetiya Simko wek nîşane û serkirdeyekî şoreşgêr û tekoşerê netewa kurd cihê rêz û hurmeta gelê kurd e û bi hezaran xortên kurd bi hezkirina wî, navê Simko li ser wan hatiye danîn û bi dehan cihên giştî û xwendingeh û...hwd jî, her bi vî awayî. Ku wusa bû nav guherîn ne karek e ku dikare cîbicî be, û ne jî çareseriya arîşan e.

Baştir ev e ku li hember bihevrejiyanek bi tebahî û dirêjheyam di navbera kurd û Asoriyan de, bi rihek lêborîn û bi riha hevdu qebûlkirinê, ber bi pêşerojê ve pêngavan bavêjin û bi vê karê me yê hevbeş, em dikarin berjewendiyên giştî û dirêjheyam bidest bixin.

Di dawiya babetê de bi pêdivî dizanim ev gotina Axa Pêtros fermandeyê hêzên Asoriyan bînme bira birayên Asorî, ku piştî vê hemû şer û kuştinê û wêrankirinê ku bixwe roleke destpêkî têde hebûye, daxwaz ji aliyên kurd û Asoriyan kiriye û gotiye: " Birano! ez daxwazê ji we dikim ku li hember mirovaniyê de bilez rojên aştiyê bidest bixînin, heya ku di pêşerojê de me pêdivî bi xwarina goştê newiyên xwe tunebe".

AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647507107014

Rê û resma bi axê sipartina termê şehîd Muhendis Riza Xeyatî